## RASTÎNAMEYA

## PADIŞAHIYA

# KURDISTANÊ

GABAR CHOLI

**Berhev kirin: Şivan Akreyî**

**BI NAVÊ XWE DÊ REHMÊ EVÊ KU REHMÊ DIDET**

[59] **EV** e ku hemû asiman û erd û hemû tiştê li nawbera wan da, li şeş roja da afirandin û paşê **XWE** li ser **text** damezirand, **EV** Xwedanê Rehmê ye; lewma pirsa **EV** ê herî agahdar bike.

***Xwandin (Quran) a pîroz 25:59***

[29] **EV** bû, **EV** ê ku hemû tiştên li ser rûyê erdê bo te afirandiye. Paşê berê **XWE** da esman û heft esman çêkirin. **EV** e, yê ku her tiştî dizane.[30] Gava ku Xwedanê te gote firişta (milyaketa), ´**EZ** ê **BiXWE cêgirekê** danême ser erdê, firişta got: ´**TU** dê yêkê li wir bicih bikî ku bibe hokar (sebeb) ê gendelî û xwîn rijandinê. Dema ku em pesna **TE** pîroz digrin û pakiya **TE** radgehînin? Lê **XWE DÊ** got: ´´**EZ** tişta dizanim lê hûn nizanin. ´´

***Xwandin (Quran) a pîroz 2:29-30***

[55] **XWE DÊ**, belêniyek daye ewên li naw we da ku, bawer diken û karên baş diken; **EV** dê wan li ser erdê, bikete **cêgir** her wek ku **VÎ**, ewên pêş ewan da hatî jî kirinê; **EV** dê damezrînît, ew dînê ku **VÎ** bo wan hilbijartiye; û paşê **EV** dê, tirsa wan vegoherîte tenahiyê. ´´Ew dê, **MIN** biperestin û çi tişta nakene hevkarê **MIN**´´ Ewên ku piştî **evê** bawer neken, bes ew bi pêdagirî serkêşin. [56] Nûbêjê (nivêjê) bidomînin, ew xêra ku bo we hatiye dîhar kirin biden û peyrevî li peyamber biken, belke li ber hindê, rehm bi we bête dan.
***Xwandin (Quran)a pîroz 24:55-56***

Hûn bi çavê xwe dibînin ku **XWE DÊ**, Padişah û Xwedanê hebûn û nebûnê ye û em mirovên bawermend jî cêgirê **VÎ**, Padişahê ser erdê ne!

Bo mirov bûnê koletî bê nirxtrîn şêweya jiyanê ye û Padişahî jî bi nirxtrîn û giran buhatrîn şêweye. Lewma bi nav û fermana

**XWE DÊ**, ez Kurdê bawermend, dê Padişah bijîm û Kurdistanê jî bikeme Padişahî.

**Qanûna Padişahiya Kurdistanê**

Padişahiya Kurdistanê li 7 Şahbajêra (nawçeyên federal) pêk hatiye.

- Şahbajêra Amedê. Li şahbajêra Amedê perwerdeya dibistana bi devoka kurmanciye.
- Şahbajêra Hewlêrê. Li şahbajêra Hewlêrê perwerdeya dibistana bi devoka soraniye.
- Şahbajêra Dêrsîmê. Li şahbajêra Dêrsîmê perwerdeya dibistana bi devoka zazakiye.
- Şahbajra Pawe. Li şahbajêra Pawe perwerdeya dibistana bi devoka hewramiye.
- Şahbajêra Kirmanşahê. Li şahbajêra Kirmanşahê perwerdeya dibistana bi devoka lekiye.
- Şahbajêra Îlamê. Li şahbajêra Îlamê perwerdeya dibistana bi devoka kelhoirye.
- Şahbajêra Xaneqînê. Li şahbajêra Xaneqînê perwerdeya dibistana bi devoka goraniye.
- Zimanê fermiyê Padişahiya Kurdistanê devoka kurmanciye.
- Di Padişahiya Kurdistanê da hemû devokên zimanê Kurdî bi tîpên latînî têne nivîsîn.
- Paytextê Padişahiya Kurdistanê Amed e.
- Gelê Padişahiya Kurdistanê wekhev û azad bi hilbijartin û parliman biryarê li ser jiyana xwe didet.
- Gelê Padişahiya Kurdistanê azade li hilbijartina rêbaza jiyan, kar û peyrevî li her nawendekê hizrî û dînî.
- Di Padişahiya Kurdistanê da dîn û dewlet li hew cuda ne.

- Gelê Padişahiya Kurdistanê XWE DÊ, Yêkta dipereste û mafê hemû dînên Yêkta perestiyê wekhev hatiye parastin.
- Di Padişahiya Kurdistanê da mafê jin û mêra wekhev hatiye parastin û di rêweberiya welat da jin xwedî 50% ê desthilatê ne.
- Ertêşa Padişahiya Kurdistanê parêzerê ew qanûnê û yêkitiya welatê Padişahiya Kurdistanê ye.

**Perwerde bi zimanê Kurdî li Padişahiya Kurdistanê da**

Pêwîste bête gotin ku girîngiya dabeş kirina welatê Padişahiya Kurdistanê li ser 7 şahbajêra digerête ser pêwîstiya parastin û perwerdê bi devokên zimanê Kurdî.

Mirovê ku wateya peyva di zimanê xwe yê zikmakî da nizane, nikare bi rastî û başî xwe bîne ziman. Ew mirovê wisa nexweşiya rûhî peyda diket. Derencam ewe ku, mirovê zimanê xwe nizane, têgeheştineke rast li çanda xwe nîne, nikare bi şêweyeke serast pêwendiya girêdet û pêş bikewît.

Jiboy ku mirov bikare hest û tê-ramanê xwe bi başî bîne ziman, pêwîste peyvên serast bikar bîne taku pê wateya wan armanca dilxwaz bidest bîne.

Lewma pêwîste mirov zimanê dayka xwe bizane taku mirov bikare navê tiştên li der dorê xwe bi serastî bizane û wêneyeke rastî li siruşt û hebûnê di mêjiyê xwe da hebe.

Bitaybetî ew jina ku zimanê xwe yê zikmakî nezane, nikare hest û tê-ramanê xwe bi serastî bîne ziman û pêwendiyên erênî girê dibet. Jina wisa dê cîhan-bîniyek nivîşkan li jiyanê hebît. Ew jin wisa jî, dê zarûkek nexweşê ruhî bizêt. Zarûkê nexweş têgeheştineke şaş li wateya peyva, jiyan û hebûnê heye. Berhema cîhan-bîniya nivîşkana dayikê, zarûkek nexweşe. Berhema zarûkê nexweş civakek xirabe ku karên genî diket.

Mirovê nexweş bi nezanî karên xirab diket, dema karên xirab nehatine serast kirin genî dibin. Mirov pê berhemên genî nikare

pêwendiyeke baş digel siruşt û mirova girê bidet û li rastî û hebûnê bîhanî dimîne.

Mirovê ku zimanê xwe nezane kore û bê cîhan-bîniye. Civaka bê cîhan-bînî bi kole bûn û li nav çonê tê siza dan.

Zanîna peyvên rast dibe hokar ku zarûk bikare pêwendiyeke dirust digel dayka xwe girê bidet û bi saxlemî û baştrîn rêbaz hest û

tê-ramanê xwe bîne ziman.

Ew mirovê ku nekare hest û hizrên xwe bîne ziman, ew mirov hesta di hinavê xwe da difetisîne û ew hizrên ku nikare bi ziman bêje, di serê ew mirov da dibine deng.

Dengê negotî dibine hokarê (sebebê) şerê nebihîstî û nedîtî li serê mirov da.

Li ser bin-axeya ew têgeheştinê, pêwîste her takek Kurd devoka zimanê xwe yê zikmakî bizane û bikare bi rêbazeke saxlem hest û tê-ramanê xwe bîne ziman û bikare keresteyên pêwîst jibo bicih înana armanca xwe bidest we bîne.

Hokara ku ta ev gavê me Kurda nekariye serbixwe dewletekê ava biken digerête ser ziman. Zimanê me Kurda gelek zarawe û bin zarawe hene.

Welatê me jî li nawbera çar dewleta da hatiye par wekirin. Her yêk li wan dewleta jî cîhan-bîniyek taybet bi xwe, pê zimaneke bîhanî, li ser mirovên Kurdê kole kirî da disepîne.

Wateya peyva jibo pênaseya mirov bûnê, erk û mafê mirova li cîhan-bîniya her dewletekê da jî cudaye.

Peyva Kurdistanê di serê her kurdekê da herî kêm 4 wate hene.

Me kurda nekariye bi rêbazeke erênî digel yêk hevpeyvînê biken. Lewma me Kurda nekariye ta ev gavê şiroveyek hewgirtî jibo peyva mirov, Kurd û welatê Kurdistanê biken.

Hevpeyvîn peymanameyeke civakiye ku jibo çareseriya aştiyaneya pirsgirêka li peyva pêk hatiye. Jibo çareseriya erênî, pêwîste ku pêş her tiştê, em Kurd li ser wateya tîp, peyv, rêziman, ziman û

cîhan-bîniya mirovê Kurd rêk bikewin taku em bikarin bigehine armanca hevbeş.

## Zimanê Kurdî

Ta ev gavê me Kurda bi şêweyeke serbest çi serjimêrî nekirîne ku em bizanin kanê em çend kesin û çend kurd bi çi devokekê zimanê Kurdî dipeyvin.

Li gor serjimêriyên ku li wan salên derbazbûyî da hatine kirin, tê gotin ku hejmara Kurda 40 milyon ta 70 milyon mirova ye. Piraniya wan mirova jî li Bakûrê Kurdistana dagîrkirî dijîn û bi devoka kurmancî dipeyvin. Bi çavdêriyeke lezgîn li ser erdnigariya Kurdistanê, em dikarim bêjim ku nêzîk %75 ê kurda bi devoka kurmancî dipeyvin. Lewma pêwîste ew rastiyê li berçav bigrin û kurmancî weke zimanê fermi jibo danûsitandin û dewletdariyê bikar bînin.

Em dizanin ku li ber şerê birakujiyê li Başûrê Kurdistanê hindek kelecan û tengeje li ser devoka Kurmancî jibo zimanê Kurdî çêbûye. Partî û rêkxistinên siyasiyê Kurda jî li ber berjewendiyên hizbî û take kesî, çi xebatên erênî û bingehîn bo çareseriya ew pirsgirêkê nekirîne.

Cihê keyfxweşiyê ye ku miqama piraniya devokên zimanê Kurdî wekhev hêdî ye. Gava em Padişahiya Kurdistanê ava biken, tenê li 20 sala da, bi perwerde kirina nifşekê, dê hemû zaraveyên zimanê Kurdî bibine bin-zarawe û mirovên Padişahiya Kurdistanê dê bikarin weke şêniyên gundeke biçûk digel hev bipeyvin.

**Tîpên zimanê Kurdî**

Jiboy ku em Kurd, bo geheştin bi armanceke hevbeş, li ser rêbazekê bimeşin, pêwîste em hevpeyvînê li ser mijara pirsgirêka Kurdê kole û welatê Kurdistana dagîrkirî biken.

Jiboy ku em bigehine armanca mebest, pêwîste em keresteyên serast bikar bînin. Pêwîstiya serekî jibo hevpeyvîn li nawbera mirovên Kurd da, zimanek yêkgirtiye û li wê girîngtir jî nivîsîn pê tîpên wekheve.

Berawird digel tîpên erebî girîngiya bikar înana tîpên latînî digerête ser çend hokarên dîrokî û zimanvanî.

Herçend ku tîpên latînî bi şêweyeke bêhtir bersiva daxwazên zimanê Kurdî diden, lê vê gavê Kurd li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê tîpên erebî bikar tînin.

Em li serdemekê da dijîn ku li rêya tora întêrnêtê we zanist li ser kampiyotêrê tête par wekirin. Bi şêweyeke giştî tîpên ragehandina zanistê li dinyayê da latînî ne.

Bi şêweyeke ferehtir em dikarin bêjin tîpên latînî; guncawtrîn tîpin jibo beyan kirina mijarên zanistî weke bîrkarî, kemîstrî (şîmî), kod nivîsîn, fîzîk û nivîsîna formula.

Her wisa eger mirovê kurd bixwaze bi rêbazeke ser û ber hizra xwe bîne ziman û bi şêweyeke zelal pênaseya nav, cih û tiştên taybet li çîrokekê da bike, mirov dikare bi rihetî li rêya bikar înana tîpên mezin bi latînî ew kar biket. Ew tişte dibe hokara zelal bûna mijara û hêsankarî li fêrbûna ziman û mijaran di zimanê Kurdî da.

Bikar înana tîpên latînî dê bi şêweyek lezgîn û yêkcarî yarmetiya me biket ku em zimanê Kurdî li dengên zimanên bîhanî paqij biken.

Zimanê Kurdî zimanek çiyayî ye. Dengên zimanê çiyayî li dew û ser lêva da tên, lê hindek dengên zimanên deştê, wek zimanê erebî ku li qirikê da tên têkilî zimanê Kurdî bûne.

Ciyawaziya serekî li nawbera hejmara denga li tîpên latînî û erebî da jî digerête ser heman mijarê.

Pê tîpên latînî emê zimanê Kurdî li bandora zimanên bîhanî, bitaybetî zimanê erebî rizgar biken.

Di mijara nivîsînê da jî, gava mirov pê tîpên latînî li ser tênûsê dinvîse, mirov hêzek kêmtir bikar tîne. Berewajî nivîsîn bi tîpên erebî, gelek kêmtir pêwîste ku mirov destê xwe li ser tênûsê raket taku peyva paştir binvîse.

## Paytextê Padişahiya Kurdistanê

Paytext nawenda dewletdarî û biryara welate. Li ber xatira hegerên dîrokî û zanistî giringiyeke taybetî bi cihê ava kirina paytext tête dan. Eger derfetên erdnigarî li ber dest bin, dibe paytext li nawenda welat bête ava kirin. Ew yêke, ta astekê zor, parastina jiyana siyasiya welat misoger diket. Eger derfetên keş û hewa berhew bin, dibe paytextê welat li bajêrekê bête ava kirin ku hewayeke xweş hebe.

Bi awayeke siruştî bajêr li ser avê têne ava kirin û jibo zêde bûna avahiya û berfereh bûna paytext dibe weke pêwîst deşt li ber dest bin.

Bi liber çav girtina ew rastiyane, bajarê Amed ê berbijêrekê herî kêrhatiye ku bibe paytextê Padişahiya Kurdistanê.

Berawird digel bajarê Amedê, Hewlêr, Silêmanî, Qamişlo, Sine, Kirmaşan û Urmiyê yan av û erdê pêwîst jibo zêde bûna avahiya paytext nînin yan jî li nawenda welat dûr ketine.

Bajarê Amedê xwedan dîrokek kevnare, hewayeke xweş heye û li ser çemê Dîcle ava bûye û nêzîkê nawenda welatê Padişahiya Kurdistanê ye.

Her wisa Amed mezintrîn bajêre ku bi devoka Kurmancî dipeyve.

## Hilbijartin li Padişahiya Kurdistanê da

Zanista mirovê Kurd li baweriya wî ya dînî bûye hokar ku mirovê Kurd xwe li ew dinyayê da weke mêwanekê bibîne ku li bal

XWE DÊ, we bi rastiya bawerî bi XWE DÊ, tête taqî (imtîhan) kirin. Lewma pêwîste mirovê kurd bi serbestî bijît taku bikare hizir û tê-ramanê xwe bîne ziman û xwe nas biket.

Me mirova tenê derfetek bo jiyanê li ev dinyayê da heye, lewma her miroveke Kurd dibya ew derfet hebe ku bi hilbijartina qanûna Padişahiya Kurdistanê, mafê jiyan, xebat û serbestiya tê-ramanê bixwe û hemû şêniyên welatê Padişahiya Kurdistanê biparêze.

Bi serbestî li kar û jiyanê da, mirovê kurd dê bikare saxlemiya ruhî û rewanî hebe û rastiyê tam biket. Misoger kirina mafê jiyan û xebat bi azadî, dê bibîte hokarê hatine rojeva mirovek saxlem û civatek rast ku bi aştî li rêya hilbijartinê we, xwe li siyasetê da tîne ziman û zindî dimîne.

Siyaset yanî honera jiyanê. Jiboy ku avahiya Padişahiya Kurdistanê li ser bin-axeyek rast bête ava kirin, şîn bît û ta bêdaviyê jiyanê biket, pêwîste her miroveke Kurd xwe padişahê Padişahiya Kurdistanê bizane û bi hizir, tê-raman û xebat jiboy berdewam bûna Padişahiya Kurdistanê berxwe bidet. Her miroveke kurd dibe weke padişah bi hizir, gotin û kiryarên rast, xwe bîne ziman û li ser rêbaza xwe-rêberiyê bixwe biryarê bidet.

Li jiyana take kesî û rêberiya dewletê da, jin û mêr wekhev biryarê diden û li rêberiya welat da, hevkar û hevparin.

Mirovên Padişahiya Kurdistanê bi deng rêberiya welat diken û bi dengdan ber-bijêrê xwe hildibjêrin û niwênerê wan li parlimanê da biryarê li ser mijara diden.

Di Padişahiya Kurdistanê da 3 parliman hene.

Parlimana şahbajêra: di parlimana şahbajêra da, şêniyên şahbajêra biryarê li ser mijarên taybet bi rêberiya şahbajêra diden.

Parlimana Padişahiya Kurdistanê: di parlimana Padişahiyê da, niwênerên gelê Kurd biryarê li ser mijarên welatê Padişahiya Kurdistanê diden.

Parlimana Pîra: parlimana pîra bilindtrîn û bihêztrîn rêkxistina Padişahiya Kurdistanê ye. Erkê parlimana pîra, parastina qanûna binaxa Padişahiya Kurdistanê ye û pêdaçonê li ser hemû biryarên parlimana Padişahiya Kurdistanê da diket ku wan erênî biket. Parlimana pîra li 21 mirovên Padişahiya Kurdistanê da pêk hatiye. Her şahbajêrek pê 3 kesa pişikdariya parlimana pîra diket.

**Parlimana pîra erkê Padişahê Padişahiya Kurdistanê digêre.**

Her çar sala carekê li Padişahiya Kurdistanê da hilbijartin tê kirin.

Li welatê Padişahiya Kurdistanê da, her kesek tenê 2 cara dikare bibe endamê parlimanê.

Pêwîste temenê ew kesê ku dixwaze bibe endamê yêk ji wan parlimanên Padişahiya Kurdistanê di nawbera 40 ta 46 saliyê be.

Çi ciyawaziyekê jî naket ku kîjan parliman be. Nabe temenê endamên parlimanên Padişahiya Kurdistanê li 52 sala zêdetir be.

**Dîn li Padişahiya Kurdistanê da**

Wateya peyva dîn yanî: mirov xwe bi reha xwe we girê det. Reha me jî li çîroka bin axa me da serçave digre. Yanî bo jiyana bin axê da mirov bawerî bi çi çîrokekê diket.

Pêwîste bête gotin ku jiyan çirokeke ku destpêk û daviyek heye. Mirov jî li çîroka jiyanê da kargêrên xwedan çîrokin.

Ew hêza ku mirov li çîroka jiyana li ser axê da ber pêşve pal didet girêdayî bi bersiva pirsa jiyanê li çîroka bin axê daye. (dema ku mirov mir û ço bin axê da, dê çi jiyanek hebît)

Baweriya mirova bi çîroka ku li bin axê da çi tête serê wan dibe hokar ku mirov çawa li ser axê rabin, rûnên û jibo jiyana xwe çi biryara biden.

Bi şêweyeke giştî em dikarin baweriyên dînî li ser 2 koma da par weken. Bot perestî û XWE DÊ perestî.

Em dikarin mirova jî li ser 2 koma da dabeş biken. Ew mirovên ku xwe dispêrine XWE DÊ, ew dibine Yêkta perest (li zimanê erebî da dibêjine ew mirova Mosliman) û ew mirovên ku xwe dispêrine destê hestên xwe, ew jî dibine bot perest.

Bot perestî yanî pir xwedêtî. Hindek xwedêyên direw, xwedanê xwedêyê dîke ne û ew zane.

Li bot perestiyê da komek hêz, xwedanê hebûnê ne û hindek hêza desthilatek zêdetir li hêz û botê dîke hene.

Li ber xatra ew têgeheştinê, bawermendên bot perestiyê çi cara nikarin xwe li tepeserî û kole bûnê rizgar biken.  Di têgeheştina mirova li serçaveya hebûnê ew bawerî gelek sawa ye.

XWE DÊ perestî, yanî Yêkta perestî, bi wateya ku ne kesê EV zaye û ne jî EV kesê dizêt. XWE DÊ perestî yanî bin axe û serçaveya hemû tiştekê di hebûn û nebûnê da XWE DÊ ye.  Li ber dewlemend bûna zimanê Kurdî peyva XWE DÊ, hem nave hem jî kiryare. Peyva XWE DÊ bi tewawî pênase û şiroveya Xwedanê hebûn û nebûnê diket.

Hemû gelê Kurd Yêkta pereste û piraniya me Kurdên Yêkta perest jî peyrevên dînê Ibrahîm peyamberin. Piraniya kurda jî xwe pê peyva zimanê erebiya Moslman (xwe sipartî bi XWE DÊ) didene nasandin. Reha me mirovên Kurd XWE DÊ, ye.

Her wek li Xwandin (Quran) a pîroz da dibêje: ´´Em li XWE DÊ ne û emê wegerêne bal XWE DÊ´´

Em tenê li ew dinyayê da bo demekê weşartî jiyanê diken û li ew jiyanê da, em bi rastiya hişyarî bi XWE DÊ têne taqî (îmthan) kirin.

Her wek qanûna piraniya welatên dinyayê jî, qanûna ku mafê mirovên welatê Padişahiya Kurdistanê diparêze, li ser bin-axeya dînê Ibrahîm peyamber hatiye ava kirin.

Dînê fermiyê Padişahiya Kurdistanê, dînê Ibrahîm peyambere.

Di qanûna Padişahiya Kurdistanê da jî, rêz li şopînerên hemû peyamberên Yêkta perestiyê têt girtin û mafê wan hemûya wekhev parastiye.

Di Xwandin (Quran) a pîroz da XWE DÊ dibêje: Li Roja Vejiyanê da XWE DÊ, dê dadwerê kiryarên peyrevên peyamberên yêktaperestiye be.

Erkê me mirova eve ku rêz li hemû bawermendên Yêkta perest bigrin.

**Mamostayê Yêkta perestiyê**

Ibrahîm (Ê brehim) kurê Azer (Ê zer) e. Navê jina wî Sara (Sar ê) ye. Ibrahîm yan mam yan jî kor mamê Lat (Welat) peyambere. Ibrahîm li serdemê Nemrûd (Ne mir) padişah, li welatê Kurdistana îro da jiyaye. Her wek hûn dibînin navê hemû ew kesên di ev çîrokê da kurdîne û ev serhate jî li welatê kurda da bûye.

Gelê padişahiya Nemrûd bot perest bûne, lê XWE DÊ, têgeheştin dabû Ibrahîm peyamber û ew pêzanîbû ku bot berhema destê mirovane û ewan çi hêz nîne.

Lewma Ibrahîm peyamber bi rêbaza lêkolîneke zanistî li Xwedanê hebûnê geriya.

Ew rêbaza lêkolîna zanistî (experimental physic) niha jî li zanko û nawendên lêkolînê li dinyayê tê bikar înan. Jiboy ew kesê ku lêkolîna zanistî diket bizane ku berhema lêkolîna wî raste û dê ezmûna zanistî derbaz biket, 3 cara pêdaçonê li ser berhema lêkolîna xwe da diket taku bi arxaynî bizane kanê bersiva pirsa bi rêbazeke zanistî û rast bi dest înaye yan ne.

Ibrahîm peyamber zanîbû ku EV ê erd afirandî li ser erdê nîne, lewma rûyê xwe kire asiman û sitêrkek dît û got dibya ewe xwedanê min bît.

Pêwîste em bizanin ku navê nêzîktrîn sitêrk li erdê ´´Proxima Centauri´´ ye. Proxima yanî nêzîk û Centaurî navê bûnewerekê ye li efsaneyeke Yûnanî da. Ew bûnewera di efsaneya Yûnaniya da niwya jorî laşê wî mirove, lê niwiya xarê ajele.

Nawbera Proxima Centuri û erdê 40,208,000,000,000 Kîlomêtre. Bi wateyek dîke yanî Proxima Centuri zêdey 4 salê ronahiyê li erdê dûre. Ronahî bi lezgîniya 300,000 kîlomêtra li çirkê (saniyê) da dimeşît. Eger em bi lezginiya 300,000 kîlomêtra li çirkê da bimeşin dê 4 sala bikêşît heta em bigehine Proxima Centuri.

Gava şevê, tu li sitêrkekê li asiman dinhêrî û çavê xwe dimiqî û carek dîke li ew sitêrkê dinhêrî, edî ew sitêrk li ew cih nîne ku pêş çav miqînê te dîtibû. Ew sitêrk nêzîk 300,000 kîlomêtra li ew cihê ku cara pêş çav miqînê te dîtibû dûr ketiye!

Girîngiya sitêrka jî li jiyana me da ewe ku em pê sitêrka cihê xwe dizanin û rêya nas diken. Reng be li welatê çiya da mirov bikare dar û bera dest nîşan bike ku rêya xwe peyda biket lê li naw daristana, çolê û ser deryayê, pê stêrka mirov dizane li çi erdekê ye û rêya xwe peyda diken.  Sitêrk sembola cih in!

Ibrahîm peyamber xwe bezir dizanî û li ber sitêrkê pariya bû ku rêya xwe peyda biket, lê gava sitêrk ava bû, wî got ewa ku ava dibe nikare xwedanê min be.

Paşê heyv derketibû û Ibrahîm peyamber li ber heyvê pariya bû. Lê gava heyv jî ava bibû Ibrahîm peyamber dîsa gotibû ewa ku ava bibe nikare xwedanê min be, Xwedanê me hemû gavê heye!

Girîngiya heyvê li jiyana me mirova da digerête ser dem! Em pê heyvê dem, demsal û sala dihejmêrin. Gava ku heyv heye, jiyanê dem (wext, zeman) ek dîhar kirî heye, lê gava heyv (dem) nebe edî jiyana me mirova bêdavî dibe. (axer zemane). Heyv destpêk û daviya dem e. Her wisa heyvê bandoreke rastev-xwe li ser rewşa jina ya mangane heye. Eger heyv nebe edî jin nakewine naw rewşa

mangane û belke edî ew pêgiran nebin, belke edî jin nezên û edî çi mirov li ser erdê nemînin.

Her wisa li Xwandin (Quran) a pîroz da, XWE DÊ, dibêje heyv tîş (ker) bûye û daviya dem, nêzîke! NASA yê tîş bûna heyvê piştrast kiriye! Li gor lêkolîna NASA yê, hem heyv li hev bilav dibît hem jî di-tebixîte naw hevda! Kes jî nizane dê kengê heyv li nav biçît. Heyv sembola dem e!

Paşê Ibrahîm peyamber li ber Rojê pariya bû û gotibû dibay ew xwedanê me bît, lê gava roj jî ço ava. Ibrahîm peyamber gotibû, Xwedanê me, Xwedanê hebûnê û ew tişta ye jî ku diçine ava.

Girîngiya rojê jî digerête ser ronahiya wê. Eger ronahiya rojê nebe, çi tiştek li ser erdê şîn nabe û ewa ku em bi jiyan (hebûn) li ser erdê û kom sitêrka rêya şîrî (milky way) nas diken, edî namîne. Ibrahîm peyamber hingê zanîbû ku Xwedanê hebûnê li nebûnê da ye.

Roj sembola hebûnê ye!

Ibrahîm peyamber bi rêbazek zanistî (experimental physic) me rêniwînî diket ku Xwedanê sembola hebûn (Roj) dem (Heyv) û cih (Sitêrka) li nebûnê da ye.

Em hemû tiştekê heyî pê şiklê (wêne) wan dibînin. Yêkemîn şikl ku li hebûnê da xûya dibe 3 goşe hene. Bi ders wergirtin li rêbaza Ibrahîm peyamber, em li mijara çareseriya têgeheştin li pirsa

XWE DÊ, bi çavdêriya 3 goşeya hebûn, dem û cih, em dizanin ku Xwedanê hebûnê li nebûnê daye.

Di Xwandin (Quran) a pîroz da jî, amaje hatiye kirin ku em têne taqî (imtihan) kirin kanê em dê nedîtî bawerî bi XWE DÊ biken ya ne!

Pêwîste bête gotin ku Ibrahîm peyamber mala XWE DÊ ava kir, nûbêj (nivêj) kirin damezirand û jiboy ku mêrên XWE DÊ perest li bot peresta cuda bike, sinet kirin dest pê kir.

Li naw bot peresta, gelek cara mirova jibo bota qorbanî diken lê Ibrahîm peyamber bûye destpêka qorbaniya ajela jibo XWE DÊ!

Yeqûb (Israîl), Mûsa, Îsa, Mihemed peyamber û gelek peyamberên dîke jî aştiya XWE DÊ li ser wan be, hemû peyrevên dînê Ibrahîm peyamberin.

Ibrahîm peyamber li Kurdistanê ra mizgîniya Yêkta perestiyê jibo dinyayê biriye.

Qanûna piraniya welatên dinyayê jî li ser bin-axeya dînê Ibrahîm peyamber ava bûye. Welatên weke Japon, Çîn û Hindûstan ê jî li ber

danûsitandin û endam bûn li rêkxistinên nawnetevî weke UN ê, ew jî li jêr bandora qanûna dînê Ibrahîm peyamber da dijîn

## Dîn û dewlet li Padişahiya Kurdistanê da

Em li rêya dîn we xwe, bi Xwedanê xwe we girê diden. Ew rêbaze berhema pêwîstiya pêwendiya mirova bi Xwedanê xwe ye, eve rastiya bêpayan û neguhere, lê dewlet berhema têgeheştina me li pirsa jiyana demkî li ser erdê ye.

Dewlet û rêbaza rêweberiya welat berhema dest û hizra mirova ye.

Qalîteya dewletê û rêweberiya welat jî girêdayî bi zanist û têgeheştina mirovaye. Têgeheştina hemû mirova jî ne wekheve. Zanista mirova herdem û hergav pê lêkolîna berfirehtir dibe. Bi awayeke siruştî mirov dixwaze rêbazên baştir bo tenahî li ev jiyana demkî da peyda bike.

Raste ku qanûna dewleta Padişahiya Kurdistanê li ser bin-axeya dînê Ibrahîm peyamber ava bûye. Bes dîn naguhere, lê merc û şertên jiyanê pêka dem diguherin û zanista her mirovekê li dîn pêka têgeheştina wî ye.

Têgeheştina her mirovekê li rêbaza xwe bi Xwedanê xwe, we girêdanê (dîn) cudaye.

Ya durust ewe ku dîn weke xwe rast û pîroz bimîne. Bila dîn û XWE DÊ, perestî nebîte keresteya destê çi mirova û çi kes dîn û XWE DÊ perestiyê nekete keresteya tepe serî û bin pê kirina mafê mirovên Padişahiya Kurdistanê.

Bila çi kes û alî derfeta kuştina mirovên Padişahiya Kurdistanê li ser rêbaza wan ya XWE DÊ, perestiyê peyda neket.

Jibo mînak em dikarin li dîroka gelê kurd li 50 salê derbaz bûyî da bîbînin ku Sedam Hisên Xwandin (Quran) a pîroz kire keresteya fermana komkojiya gelê kurd. Xomeynî jî bi navê XWE DÊ perestiyê got ku ewên li kurdistanê li serwey kafira cih girtine û fermana şer digel gelê kurd da. Bi caran jî Erdoxan li meydanên hilbijartinê geriyaye û bi navê XWE DÊ perestiyê gotiye ku ewên ku jibo mafê kurda xebatê diken Zerdeştî ne û bûye hokarê kuştin, eşkence û bêdadiyê li gelê Kurd. Niha jî eskerên tirk li bajarê Kurda, pê banga Ya Alah, Bîsmîlah hêrişî kurda diken.

Pêwîste em kurd li dîroka gelê xwe waneya (dersa) bistînin û çîroka dagîrkerên welatê xwe ser li nû nejîn. Bila zarûkên me êxsîr û qorbaniya têgeheştina me nemînin.

Emê dînê xwe li dil û mizgewtê da pîroz xwedan biken.

Di Xwandin (Quran) a pîroz, li 5:32 ê, XWE DÊ, dibêje: ´´[32] **Ber xatira wê hindê, Me ferman li zarûkên Israîl kir, eger her kesek mirovekê bikujît, meger ew li şûna kuştinê bît yan jî liber belavkirina gendeliyê li ser erdê, weka ewêye ku ew hemû mirovatiyê dikujît, di dema ku eger kesek jiyanekê rizgar ket, weka wêye ku ew jiyana hemû mirova rizgar diket, peyamberên Me pê belgeyên zelal hatine bal wan, lê piraniya wan li zêdegaviya li ser erdê, da berdewam man.** ´´

Em mirovên XWE DÊ, perest û peyrevên dînê Ibrahîm peyamber nabe pê qanûna Padişahiya Kurdistanê rewşekê wisa pêk bînin ku mirovên nezan, dîn û baweriya me bikene keresteya xwe sepandin li ser mirovên Padişahiya Kurdistanê.

Eger rojekê li ser mijara bin pê kirina mafê mirovên Padişahiya Kurdistanê lêpirsîn hate rojevê, bila çi kes xwe li pişt Xwandin (Quran) a pîroz neweşêre û nebêje XWE DÊ ew biryar daye min û tepe serî û mirov kujiyê bi erk û mafê xwe nezane.

**Erk û maf li Padişahiya Kurdistanê da**

Serçaveya mafê mirova girêdayî bi baweriya mirova bi dînê wane. Ew bawerî, mafê wan misoger diket û her wisa jî mirova erkdar dike ku mafê xwe bizanin û jiboy parastina mafê xwe herdem li ber xwe biden. Em kurd Yêkta perestin û piraniya me Kurda jî peyrevên dînê Ibrahîm peyamberin. Bi sirûş (îlham) wergirtin li Xwandin (Quran) a pîroz û qanûna wê, mafê jin û mêra li qanûna Padişahiya Kurdistanê da wekhev parastiye.

Ew baweriye bin-axeya erk û mafe li cîhan-bîniya Padişahiya Kurdistanê da.

Di Padişahiya Kurdistanê da, me binemale li ser perwerdeya mirov bûnê ava kiriye û mirov bûn jî li ser bin-axeya mafê jiyanê ava bûye. Li jêr sîbera rehma XWE DÊ da, bi baweriya mirovê Kurd bi mijara mafê jiyana wekhev bo hemû şêniyên Padişahiya Kurdistanê, emê bersiva pirsa erk û mafê mirovê kurd li Padişahiya Kurdistanê da biden. Li ser ew têgeheştinê, dewleta Padişahiya Kurdistanê li ser bin-axeya civaka Kurdî hatiye ava kirin. Civaka Kurdî jî li komek binemaleyên kurd pêk hatiye. Tenahiya jiyanê li Padişahiya Kurdistanê da rast girêdayî bi erk û mafê jiyana endamên binemala mirovên kurd heye.

Di qanûna Padişahiya Kurdistanê da mafê jin û mêra li hemû astên, civak û dewletê da wekhev hatiye parastin. Jin û mêrên Padişahiya Kurdistanê wekhev li ser çarenûsa xwe biryarê diden û bi pişikdarî li hilbijartina da, xwe erkdar dizanin ku mafên xwe biparêzin

## Pênaseya mirov bûnê li Padişahiya Kurdistanê da

Berî ku em bixwazin pênaseya kesayetiya çandî, civakî, rûhî û şûn pêyê dîrokiyê mirovê Kurd biken, pêwîste em bi rêbazeke rast û zelal pênaseya mirov biken.

Li destpêkê da bi awayeke siruştî, gava em hizir li mirov biken, em şêweya hebûnek rihtiber dibînin ku li dest, pê, ser, çav, dev û guha pêk hatiye. Lê ew pênase gelek seretayî û sadeye. Ajel (heyvan) jî xwedan ser û pê dest û çava ne û bo jiyanê li ber xwe diden.

Eger em bêjin mirov ajeleke ku agahdarê hişyariya xwe ye û tê-ramanê li hebûna xwe diket, ew pênase jî têra mirov naket, mirov xwedanê komek hesta ye û li rewşên cuda da bi hestên ciyawaz û bi tê-raman (mentiq) xwe tîne ziman.

Lê eger em bixwazin bêjin mirov bûn di hesta da ye, dîsa jî em pênaseyek sawa li bûnewerek xwedan hestên aloz diken. Eger mirov bûn di kerb da ba, dê mirova mêjve hemû hebûn wêran kirba. Eger mirov bûn li hesta birsîtiya di zik da ba, mirova dê her tiştek xwariba, tenanet ajel jî xwe li hemû xwarinekê diparêzin.

Lê em dizanin mirov bi hişyarî gewahiyê li ser hest û pêwîstiyên zikê xwe dide û li kêleka hemû rihtibera da bi tenahî weke Padişahê wan dijît.

Tenanet di Xwandin (Quran) a pîroz jî da XWE DÊ, ferman daye firişta ku xwe li ber mirov biçevînin.

Eger em li rêya dîroka hebûnê we bixwazin bersiva pirsa mirov bûnê biden em dizanin serdemekê em di zikê dayka xwe da bûn, lê

nayête bîra me, bes mirov bûna me bîr (memory) nînin, lê em dizanin em hebûn, em li dayîk jî bûne û ew jî nayête bîra me.

Em dizanin demek dê bêt ku emê bimrin, ew jî di paşe rojê da ye û nayête bîra me, lê em bi hişyarî ew rastiyê jî dizanin û gewahiyê li ser diden.

Em bi hişyarî gewahiyê diden ku mirov bûna me laşê me jî nîne, çimkî laşê me li goştê dayka me hatiye û dema laşê me dimre, li bin axê da, dibe ax.

Laş li axê hatiye û wedigere dibe ax! Li Rênivînî (Torat) û Xwandin (Quran) ê da jî gewahî hatiye dan ku XWE DÊ mirov li axê çêkir û riha XWE pif kirê da!

Bes gava em têgeheştin ku mirov bûna me, li dest û peya pêk nehatiye nikare laş be, berhema hest û daxwazên zik û bin zikê me jî nîne, em çavê xwe bimiqin û li xwe binhêrin emê hingê bizanin ku mirov bûna me li hişyariyeke agah li pişt çavê miqî da asê bûye. Gava em lê dinhêrin hebûn, hişyarî, zanist, têgeheştin, daxwaz, tê-raman û bîreweriyên me, hemû bi tayeke nazikê nefesê we girê dayne. Gava em nefesê hildimijin em dijîn, gava em nefesê hilnamijin em dimrin.

Dema em bi çavê miqî li xwe dinhêrin, mirov bûna me di nefesa me daye, lê gava em lê nanhêrin mirov bûna me di laşê me daye.

Nefesa me, serbixwe li hinawên me da tê, lê hinawên me jî serbixwe nînin, hinawên me bi dilê me we girêdayî ye. Serçaveya hişyariya

me li ser mirov (rih) bûna me, di dilê me daye. Dilê me, hêlûna mirov (rih) bûna me jî, ser bixwe diqute.

Qutana dilê me jî denge. Deng li tayên şîpel (wave) a pêk hatiye ku dibzivin. Dema em bi hişyarî lê dinhêrin em şîpelin, lê gava em li hebûna xwe nanhêrin, em li laşekê pêk hatine û xwedanê ser, pê, dest û çavin!

Di sala 1961 ê ´Claus Johnsson´ i pê ezmûna (îmthan) kiryara pirtika ´quantom mechanic ê´ xwast bizane kanê siruşta etom (hurtrîn pirtika hebûn) ê şîpel (wave) e yan jî pirtik (matter) e. Aşkira bû, etom li jêr bandora çavdêriya mirova da weke pirtika xûya diken lê siruşta etom a şîpele. Serçava ew şîpelê jî denge (frequency).

Di çîroka hebûnê li dînê Ibrahîm peyamber da XWE DÊ got ´Bibe´ û ew hate jiyanê! Hebûn berhema gotina XWE DÊ ye! Gotin denge, deng jî li komek şîpela pêk hatiye ku dibzivin (frequency).

Pisporên zanista hebûn (physic) ê teqîna mezin (Big Bang ê) bi destpêka hebûnê dizanin, ew jî wek nav li ser, denge û li şîpela pêk hatiye ku dibzivin û jiyan dayne hebûnê ku em weke pirtika ewan pê çavê xwe dibînin.

Hemû hebûn berhema denge. Deng (şîpel) jî xwe li keziyên 6 tayî da ba diden, dibzivin û pirtik (atom) a çêdiken. Pirtik (atom) jî li keziyên 6 tayî da xwe lihev ba diden û dibine kom-pirtik (Molecule). Kom-pirtik jî li keziyên 6 tayî xwe lihev ba diden (Chemical reaction) û em wan pê şikil, di hebûn (physic) ê da dibînin. Ew şikil jî pê pîvana hejmarên Febiyonaçî weke gulekê jiyanê dipişkivît.

Di Xwandin (Quran) a pîroz da jî pê fermana (dengê) XWE DÊ, hebûn dest pê bûye. Li mirovekê (rihekê) yêk din afiran û li cot wan jî mirovahî.

Em bi rêbazeke zanistî dizanin ku em mirov(rih) li ev dinyaya demkî da mêvanin û bêy ku em pêşta agahdar bin, riha me dê rojekê bo yêkcarî laşê me bi cih bihêlît û biçîte bêdaviyê.

Em mirov bi rastiya xewnê dikarin gewahiyê li ser hebûna riha xwe biden. Em dizanin XWE DÊ li Rênivînî (Torat) Mizgînî (Incîl) û Xwandin (Quran) ê da jî me agahdarê rastiya jiyana demkî ya ev dinyayê û rastiya hebûna riha me diket.

Îsa peyamber dibêje: ´´ Li ew netirse ku dê laşê te bikuje, lê li ew bitirse ku rihê (te) dikujît. ´´

Laşê me mala dilê me ye û dilê me jî mala mirov (rih) bûna me ye. Eger dilê me baş be, gotin, hizir û karê me jî dê baş bin. Riha me dê li tenahiyê da bijît.

Pêwîste em bo jiyan li ezmûna demkiya ev dinyayê da dilê xwe pak xwedan biken taku em bikarin tê-bîniyê li mirov (rih) bûna xwe biken, Padişah bijîn û Kurdistanê jî bikene padişahî.

## Xebatkarên serxwe bûna mirovên Kurd

Gava em pêdaçonê li xebata serxwe bûna mirovên Kurd di wan 200 salên derbaz bûyî da diken, em kesayetiyên mîna Mîr Mihemedê Rewandiz ê dibînin ku jiboy kesên weke Şêx Mehmûd, Simkoyê Şikak, Ihsan Nûrî Paşa, Seyîd Riza û Qazî Mihemed bûyne wane (ders). Qazî Mihemed jî, jiboy Mela Mistefa, Dr. Qasimlû û Ebdula Ocelan bûye mînak. Ew xebatkar jî jiboy Mesûd Barzanî, Pavêl Talebanî, Cemîl Bayîk, Selahedîn Demîrtaş, Mistefa Hicrî û gelek kesê dîke bûne mînak. Kurdên weke min û te jî li hemû qonaxên dîrokê da çavnihêrê berhema xebat û berxwedana wan bûne.

Piraniya ew xebatkarên destpêkê mîr û şêx bûne ku desthilata bêdavî li ser mal û jiyana rêncberên kurd hebûne. Qalîteya xebata wan jî rastew-xwe pêwendî bi desthilata wan li ser kesayetiya kurdên kole hebûye. Kurdê kole çi cara bi awayeke rastew-xwe, xwe berpirsê çarenûsa xwe nezaniye. Tenê li ew dema ku pirsiyar li mal û desthilata mîr û şêxa dihat kirin ewan li dijî dagîrkera ser hildan dest pê dikir.

Mînaka herî berçav, serhildana Şêx Ubeydolayê Nehriye. Hokarê serekiyê serhildana Şêx Ubeydola li ser dana bac û xeracê bi Osmaniya bûye.

Şêx û mîra pê rêkxistina eşîretê rêberiya şorişa dikirin. Li rêkxistina eşîra da, rewişt, ser û berî û tenahî heye, lê di eşîrê da tenê yêk kes (serok eşîr, mîr, şêx) jibo hemû kesa hizir diket û biryarê didet. Di rêkxistinek wisa da çi derfeta pêş ketinê peyda nabe.

Lewma mirovên kurd li sedsala bîsta da, ezmûna xebatek têkçoyî digel têkçonek dîke weguherîn û mîr û şêxa nekarîn jiboy rizgarî li dagîrkera pireke têgeheştinê li nawbera xwe û rêncberên kurd da ava biken taku jiboy berjewendiyek hevpar xebatê biken.

Mîr û şêxa jiboy parastina mal û desthilata xwe xebat dikir, lê xebat jiboy parastina desthilat û malê mîr û şêxa li ser rêncberên kurd da hatibû sepandin.

Isam ê bapîrê min li nawçeya Enzela Urmiyê, rêncber (reyet) ê bin destê Emer xanê şikak bû. Emer xan yêk li wan şorişgêrên Komara Kurdistanê bû. Dema Emer xan binemale û xizmên bapîrê min li Enzelê kirne der, Isam û xizmên xwe penaberê Mirgewera Urmiyê bûn. Li mirgewera Urmiyê jî Isam bûye rêncberê mîrê Herkiya. Qalîteya jiyana hemû rêncberên Kurd jî weke ya Isam ê bapîrê min girêdayî bi biryara Mîr û Şêxa we hebû.

Mîr û Şêxa navê xebat jibo parastina mal û desthilata xwe danîbû, xebata serxwe bûna Kurdistanê û ew yêk jî li ser rêncberên bê erd û bê desthilatê Kurd da kirbûne erk.

Gava darê tepeseriyê li ser serê mirovê rêncber be, çi ciyawaziyekê nake ka ew dar di destê kê daye û ew kes bi çi zimanekê dipeyve.

Şoriş jiboy serxwe bûnê, li serdema dewlet neteve jî, bi awayeke giştî li ser destê zarûkên heman ew şêx û mîra dest pê bûye, lê li ev qonaxê da erd li ser rêncberên kurd hatiye par wekirin û welatê Kurda jî li nawbera 4 dewleta da hatiye parçe kirin.

Li wan 90 salê derbaz bûyî da, me dîtiye ku dagîrkerên welatê me şêweya xebata şorişgêrên Kurd û asta bandora berxwedana kurda li jêr rikêfa xwe da xwedan kirîne.

Hokara serekî jibo ew qalîteya jiyana mirovên kurd jî digerête ser têgeheştina mirovên kurd li wateya xebat jiboy serxwe bûnê.

Herçend ku civaka Kurdî qonaxa mîr û rêncberiyê (feudalism) derbaz kiriye û li qonaxa pêşesaziyê (senetî) da dijît û hêzên hevkar (Corporation) li bazara azad da biryarê li ser siyaseta welata diden, lê çanda eşîretê hêşta jî bandorê li ser mirov û şorişa Kurda didanêt.

Wê gavê bi lezgîniya 5G ê zaniyarî li ser tora întêrnêtê têne par wekirin û xerîteyê dan û sitandinê li bazara azad da diguhere, lê hizbên kurdî li Başûrê Kurdistanê koşk û dîwan xana jibo serok eşîra ava diken û dixwazin bi desthilata xwe li ser serok eşîreta bandorê li ser hemû endamên eşîrê danên.

Li parçeyên dîkey Kurdistanê jî dagîrkerên welatê me heman tiştê diken.

Mirovên Kurd xebat jiboy serxwe bûnê weke kar û pêşe dîtine. Jiboy ku em bikarin destkevteke erênî bidest bînin, pêwîste her takek Kurd, xebat jiboy serxwe bûna xwe, bi pirsgirêka mirov bûna xwe, pênase biket û aligorê li bin-axeya cîhan-bîniya xwe da pêk bînît, taku em bikarin xwe li bandora kesên kirê girtî, rêkxistin û hêzên dagîrker rizgar biken ku bûyne hokarên koletiya me Kurda.

## Serçaveya koletiya mirov

Qalîteya jiyana mirov berhema hizr û tê-ramana mirove. Pêş ku mirov kole û êxsîr ê rêkxistin, rêbaz û mirovên der dorê xwe û hêzên derekî be, mirov êxsîrê hest û hizrên xwe ye.

Pêş ku mirov bikare xwe li koletiya hêzên derekî rizgar bike, pêwîste mirov xwe li bandora hesta, rizgar biket.

Hesta tirs li birsî manê bandoreke herî bihêz li ser şêweya biryar danê, rêbaza jiyan û kiryarên mirova heye. Hesta zik jî rastew-xwe girêdayî bi binzik e. Bi kurtasî nawenda koletiya mirov zikê mirove.

Gava mirov bikare bi rêya rojiya desthilatê li ser zikê xwe peyda biket, mirov pêngava herî girîng jibo serxwe bûn li mijara koletiyê hildigre.

Dema mirov êxsîrê birsîtiya zikê xwe nemîne, mirov xwe li bin zik û herî dawiyê jî, xwe li hizrên pêwendîdar bi hesta, li serê xwe da, xwe rizgar dike. Ew kesê ku desthilatê li ser siruştê ajelê di laşê xwe da peyda dike, ew kes yêkemîn pêngav li rêya mirov bûna xwe da havêtiye!

Ew kesê ku li jêr bandora tirs li hesta birsîtiyê da dijît ew hêşta li qonaxa ajel bûnê da jiyanê diket û weke ajelekê jî dê êxsîrê hest û daxwazên xwe bimînît.

Lê ew kesê ku desthilat li ser zikê xwe peyda kiriye, ew hest bi mirov û padişah bûna xwe jî kiriye û dê bi navê XWE DÊ li ev dinyayê da weke padişah bijît û dê padişahiyê ava biket.

Gelê Hêytiyê (Haiti) li 9 salên serhildana xwe jiboy rizgarî li darê koletiya dewleta Feransê, li ber birsîtiyê herî (ax) dixwarin, lê dîsa jî hazir nebûn ku weke kole bijîn.  Herçend ku zêdey 220 sal li ser serxwe bûna gelê Hêytiyê derbaz bûye lê şûna çanda berxwedan li dijî birsîtiyê li ew welatî dîhare. Tevî aboriya bêserûber û welatê paşve mayî, niha jî gelê Hêytiyê li birsa heriyê dixwen lê her ser bixwe mayne.

Koleyên Hêytiyê bi zordarî li Afrîqa ra înabûn. Herçend ku ew li Afrîqa da, li civakên seretayî (hunter, gatherer) da dijiyan û bot perest bûn lê dîsa jî ew hazir nebûn kolê Firansiya bimînin.

Jibo ava kirina Padişahiya Kurdistanê pêwîst naket em Kurd jî weke gelê Hêytiyê totikê heriyê bixwen.

Berewajî gelê Hêytiyê, em kurd Yêkta perestin û dahênerê çandinê ne.

Welatê me Kurda li serê kevana bi bereket (Kevana zêrîn/ fertile crescent) hilketiye.  Bi awayeke siruştî ew hilkewt bûye derfetek gelek jêhatî bo çandinê.

Li welatê Kurdistanê nok û genim kevî bûne. kevî kirina genim, destpêka avahiya mal, gund, şar û şaristaniyê ye.

Li Kurdistanê genim kevî bûye û mirovatiyê li şikeva wê nan xwariye.

Li Kurdistanê pez, se û hesp kevî bûne. Li Kurdistanê çerx çêkirîne û bere babên me mirovatî berwe pêşwe pal dayne. Li welatê me xet kêşane û mirovatiyê dîrok û qanûn nivîsiye.

Gemiya Niho peyamber li Kurdistanê hatiye xarê û Ibrahîm peyamber li Kurdistanê ra mizgîniya Yêkta perestiyê jibo mirovatiyê biriye.

Tewî ew hemû hewlên birsî hêlana gelê Kurd û sepandina şera li ser kurda, hêşta jî li welatê me qatûqirî çênebûye. Jibo rizgarî li darê koletiyê, pêwîst naket em Kurd totikê heriyê bixwen.

Li Kurdistanê tewnê mirovatiyê hatiye raçandin û jibo jiyana kêrhatiyê mirova, nabît em li birsîtiyê bitrsin. Dibya em pê rojiya desthilatê li ser zikê xwe da, ku maka koletiya me ye peyda biken taku em bikarin xwe li darê koletiyê rizgar biken.

## Serçaveya kole bûna gelê Kurd

Serçaveya cîhan-bîniya gelê Kurd jî weke hemû mirova, di baweriya wan ya dînî daye. Herçend ku mirovên Kurd peyrevî li peyamberên cuda diken, lê bi awayeke giştî em dizanin ku piraniya mirovên Kurd Yêkta perestin û peyrevê dînê Ibrahîm peyamber li ser rêbaza Mihemed peyamberin û xwe bi peyva erebiya Mosliman (ewên ku xwe sipartine XWE DÊ) didene nas kirin.

Li ser bin-axeya ew têgeheştinê, melayên Kurd li mizgewtê da erkê çandina cîhan-bîniya mirovên kurd girtine ustê xwe. Melayên mizgewtê bi şîret û rênivîniyên xwe, rê û şûnê rabûn û rûniştinê li ev dinyayê da didanêne pêşya mirovên Kurd.

Hêjayê gotinê ye ku navê Quranê bi Kurdî dibe Xwandin û yêkem peyv û fermana XWE DÊ jibo Mihemed peyamber Xwandin bû, lê Xwandin (Quran) a pîroz li welatê Kurdistana dagîrkirî da bi zimanê erebî hêlane û piraniya Kurda erebî nizanin û lê tê-nagehin.

Rastî ewe ku melayên Kurd bi şiroveya Xwandin (Quran) a pîroz pênaseya erk û mafê mirovên Kurd naken. Melayên Kurd li dibistanên mezhebî da perwerde bûne û pê çîroka (hedîsa) bangeşeya cîhan-bîniyekê diken ku li bal desthilata dewletê we hatiye erênî kirin.

Bi çav xweşandineke lezîgîn li dîrokê, em dibînin ku melayên mizgewtê hemû gavê kiryarên desthilatdara erênî kirîne.

Tenanet eger kiryarên desthilatdara li dijî qanûn û perwerdeya XWE DÊ, di Xwandin (Quran) a pîroz jî da ban.

Sed sal berê melayên mizgewtê li destê rastê mîr û begên kurda rûniştibûn û erêniya tepeserî, par wekirina mal û şêweya rêncberiyê dikirin.

Gava em Xwandin (Quran) a pîroz dixwînin em dibînin ku jina jî maf li male babê xwe da heye, lê ta îro jî çanda mafê jinê li male babe wê li civaka kurdî da şîn nebûye.

Melaya pê çîroka (hedîsa) û şiroveya çewta mafê mirova, jiyan daye kesatiya koleya mirovê Kurd.

Herçend ku rêkxistina mîr û bega nemaye û rêncberên kurd bûne paleyên xwedan erd li gunda da, lê mirovên Kurd li rewişta xwe da hêşta li bin bandora melayê mizgewtê dane.

Bi nemana mîr û bega, ew carê melayên kurd li destê rastê desthilata dagîrkerên welatê Kurdistanê da rûniştîne û bi bêdengî erêniya dagîr kirina welatê Kurdistanê diken.

Li Başûrê Kurdistanê jî melayên Kurd her wek parçeyên dîke li Kurdistana dagîr kirî li destê rastê desthilatê rûniştîne û erêniya desthilata genî diken.

Em dizanin ku li dînê Ibrahîm peyamber da birakujî yêkem guneha mirovatiyê li ser erdê ye û bi sala ye ku hizbên Kurdî birakûjiyê diken lê hêşta jî melayên Kurd û wezareta ewqaf ê li ser mijara birakujiyê bêdengin!

Her çend ku XWE DÊ, perestî kiryareke take kesiye û nikare bibe erkê wezaretekê. Lê melayên Kurd, li Başûrê Kurdistanê li desthilateke binemaleyî û genî da bi navê bicih înana kar û barên XWE DÊ perestiyê, xwedan wezaretin.

Rastî ewe ku baweriya mirov bandoreke rastew-xwe li ser qalîteya jiyan û xebata mirov heye. Ew şêweya xebata niha jibo rizgarî li jiyana bi koletî li destê dagîrkerên welatê Kurdistanê, berhema çandina mijara baweriyê û ew perwerdeya melayên mizgewtê ye.

Bi kurtasî melayên kurd kargêr û kirêgirtiyê dagîrkerên kurdistanê ne û bi çîroka (hedîs) gelê Kurd li mizgewtê da kole xwedan diken.

Melayên kurd hokarê ew cîhan-bîniyê û têgeheştina mirovên Kurd li mijara jiyana demkî ya ev dinyayê û rabûn û rûniştina mirovên Kurdin.

Pêwîste jibo rizgarî û çareseriya ev pirsê, mirovên kurd bixwe Xwandin (Quran) ê bixwînin û li gorî qanûna XWE DÊ, erk û mafê xwe weke mirov li jiyana demkî ya ev dinyayê da bizanin û bi perwerdeyek rast li hebûna xwe xwedan derkevin.

**Bandora perwerdê li ser koletiya mirovê Kurd**

Bi rêbazeke zanistî em dizanin ku mirov li rêya avikê we têne dinyayê. Gava mirow di zikê dayka xwe daye, mirov li jêr bandora xwarin, vexwarin, hest û hizrên dayka xwe daye. Dayka mirov jî, li jêr bandora çanda civakê û tê-ramanên dînî daye.

Dema zarûk li dayîk dibe, zarûk bi deng pêwendiyê digel mirovên der dorê xwe girê dide û bi deng jî bandor li ser zarûk tê danan.

Yêkem deng û bihêztrîn deng ku bandorek herî mezin li ser jiyana mirov didanêt, navê mirove! Bi têgeheştinek sawa, mirov xwe bi nav dizanin û xwe bi nav didene nas kirin. Ew nav jî tenê dengeke ku bi mirov we hatiye sincaq kirin, ew nav(deng) jî li aliyê dayk û bab we li ser mirov tê danan. Heta temenê 6 saliyê, mirov bi awayeke rastew-xwe li jêr bandora dengê dayk û babe xwe da dimîne. Dayîk û bab, pê deng çîroka hebûn û jiyanê bo zarûkê xwe dibêjin û erk û mafê zarûk pê didene zanîn.

Li qonaxa yêkê da cîhan-bînî û pênaseya mirov bûnê berhema şîn bûna ew deng û peyva ye ku dayîk û bab pê çîroka di serê zarûk da diçînin.

Li qonaxa 2ê da, gava zarûk li malê derdikeve û diçe kolanê, wê gavê ew cîhan-bîniya ku li bal dayk û baba we hatiye çandin, têtе taqî kirin. Her çend ku cîhan-bîniya (nêrîna) zarûkekê dikare li nêrîna zarûkên dîke kêmekê ciyawaz be, lê bi şêweyek giştî hind cudahî li hest û tê-ramanê mirovên civakekê da nayê dîtin ku bibe hegera nakokî û pirsgirêka. Jiboy ku zarûk bikare li kolan (civak) ê

da tevî zarûkên dîke bi aştî rabe û rûnê, pê gotina hestê xwe tîne deng û pênaseya hebûna xwe diket û jiboy saxlemiya hebûna xwe, bi deng, bo xwe sînora dîhar diket. Ew demê da zarûk bi dengê xwe ku berhema çandina ew hizraye ku dayk û baba li serê wî da şîn kirîne, parêzgariyê li bîr û bawerên dayk û babe xwe diket. Piştî qonaxa çandina malê, zarûk gelek bi zext û zelalî hest bi bandora civakê naket, çimkî mirov bo jiyan bi tenahî xwe tîne deng, ew cihê ku dengê mirov nayê bihîstin û rêz lê nayê girtin mirov lê dûr dikeve, lê piştî qonaxa mal û civakê (kolan), zarûk li jêr bandora dibistanê da dimîne.

Di qonaxa 3 ê, li dibistanê da, bi rêbazeke bername rêjî kirî, li dirêjiya çend sala da, hizr û cîhan-bînî li ser zarûka da têne sepandin û destûra rêbazek taybetî jibo dîtina dinyayê bo wan tête nivîsîn.

Li dibistanê da, jiboy pêwendiya zarûk digel dinyayê, wî fêrî xwandin û nivîsîna peyava diken û watey peyva bo zarûk dibêjin. Li dibistanê daye ku cihê peyva û bandora wan li ser mirova di qanûna welat da bo zarûka didene dîhar kirin.

Herî daviyê da çavnihêriya peyrevî li qanûna ku peyvin, li zarûk tête kirin.

Bi peyv (deng) ferman li mirova tête kirin ku rêz li qanûnê bigrin ku rêbaza rabûn-rûniştinê jibo wan dîhar diket û mafê wan li ew çarçêweyî da diparêze.

Dema mirov tê-bîniyê li kole bûna xwe diket, bandora civakê li ser xwe dibîne. Wê demê da mirov dizane li qonaxa destpêkê da, ew berhema deng, hest û tê-ramanê dayka xwe ye. Piştî wê jî perwerdeya civak û dibistanê zextê li ser kesatiya zarûk kiriye.

Em xwe bi dengekê (nav) pênase diken ku berhema devê dayk û babê me ye.

Em hest û tê-ramanê xwe jî bi deng tînine ziman, herçend ku ew hest û nêrîn tenê dengin li serê me da. Ew deng jî berhema zexta perwerdeya civak û dibistanê ne ku li aliyê dewletê we hatine erkdar kirin ka bi çi cîhan-bîniyekê me perwerde biken.

Bi kurtî, bêy ku mirov agahdar be, hebûna mirovi, berhema cîhan-bîniya qanûna dewletê ye. Mirovê wisa xwe erkdar dizane ku bo parastina tenahî û jiyana xwe, ew qanûna ku li ser wî hatiye sepandin biparêzît û pêka ew qanûnê rabît û rûnêt.

Li ev dinyaya demkî da, kesê wisa kole û berhema zexta desthilatê ye û çi cara serbixwe hest bi hebûna xwe nekirye û çi cara weke mirov nejiyaye.

Ew kes berhema avika babe xwe ye û di qonaxek cuda û di laşek nû da, hest û tê-ramanê babê xwe dijît û temenê ew cîhan-bîniya dewletê dirêj diket.

Ew kes çîroka babê xwe dubare dijît. Kesê wisa hêşta tê-negeheştiye ku ew navê ku xwe pê dide nas kirin bes tenê dengeke ku danayne ser. Rastî ewe mirov bûna kesê wisa tenê li denga pêk hatiye û ew kes li delewaneke denga da êxsîr maye.

Bi awayeke siruştî eger kesek wisa li ´Benin´ ê bête dinyayê, ew dê xwe peyrevê Voodoo yê bizane, eger li welatê Botan ê jî bê dinyayê ew dê xwe peyrevê Buda bizane. Eger li Bitlîsê jî bête dinyayê, ew kes dê peyrevî li dînê Ibrahîm peyamber biket.

Pêwîste em bizanin ku baweriyên me mirova çîrokin ku me bi rast zanîne û bi deng û reng wêneyek li serê me da çêkirîne.

Çîrok jî li paragrafa pêk hatine. Paragraf jî komek riste ne û riste jî li peyva pêk hatine. Peyv jî li tîp û denga pêk hatine ku wateyeke taybet bi cih û dema li jiyana me da peyda kirîne.

Pêwîste mirov tê-ramanê li ew dengên di serê xwe da biket ku xwe pê pênase diket û wateya ew denga bizane ku bûyne peyv û bandor li ser rewişt û cîhan-bîniya wî danayne. Pêwîste mirov tê-bîniyê li ser ew cîhan-bîniya bike ku peyvin û bin-axeya qanûna welatê wî pêk înayne ku mirov xwe erkdarê parastin û êxsîrê ew qanûna dizane.

Bi awayeke giştî mirovên kurd jî êxsîrê qanûna dagîrkerên welatê xwe mayne ku li peyva pêk hatine. Ew peyv bes dengin ku li serê mirovên kurd da hêlûna xwe çêkirîne û çavê mirovên Kurd tarî kirîne, rêya jiyan û tenahiyê li ev dinyaya demkî da, li ber mirov bezir kirîne.

Pêwîste kesê kurd xwe li bandora qanûna dagîrkerên welatê Kurdistanê rizgar biket taku ew derfetê bixwe bînîte pêş ku hest bi mirov bûna xwe biket û mirov bijît.

## Bandora qanûna dewletên dagîrker li ser kole kirina mirovên Kurd

Em dizanin ku welatê kurda li bal çar dewleta we hatiye dagîr kirin û ew dewlet pê qanûnên xwe gelê kurd kole xwedan diken. Mirovên kurd jî bi pişikdarî li hilbijartina da, pê dengê xwe dagîr kirina Kurdistanê erênî diken û bi hizr û tê-ramanên xwe qanûna dagîrkerên welatê me dixemlînin û temenê dagîrkera li welatê me da dirêj diken.

Em dizanin ku qanûna dagîrkerên welatê Kurdistanê yan li ser tepeserî yan jî li ser nikolî (haşa) kirin li mirovên Kurd ava bûye. Li her 2 rewşa da jî, qanûna dagîrkerên welatê me derfeta wê pêk nayne ku kesên Kurd bi awayek siruştî hest bi mirov bûna xwe biken.

Dewleta Îranê li ser bin-axeya Şieyên 12 îmamî, baweriya wilayeta feqîh ava bûye. Rêkxistina ew dewletê bawer diket ku rêberê wan, cêgirê Îmam Mehdiye (Peyamberê daviya zemane). Xomeynî ku damezrînerê rêjîma Îranê ye, li destpêka temenê ew rêjîmê da fermana şer li rêya XWE DÊ, li ser gelê Kurd der kir û heta wê gavê jî ew biryar berdewam diket.

Ne tenê gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistana dagîrkirî pişikdariya dengdana wê rêjîmê da diken, hizb û rêkxistinên Kurdî ku jibo serbestiya gelê Kurd jî xebatê diken, dixwazin li sîstema ew rêjîma ku gelên li ew welatî da bi omet (yêk neteve) nas diket çareseriya pirsa neteva Kurd biken.

Di sed salên derbaz bûyî da 3 rêjîmên dagîrkerên Rojhilatê Kurdistanê bi kiryarên xwe gewahiya tepeseriya gelê Kurd dayne. Herçend ku Pêşewa Qazî Mihemed komara Kurdistanê ragehand û niha Komara Kurdistanê welateke dagîr kirye, lê hizbên kurdî xwe li rastiya komara dagîr kiriya Kurdistanê weşartine.

Dewleta Sûriyê li ser bin-axeya serweriya gelê Ereb ava bûye û Rojavayê Kurdistanê dagîr kiriye. Qanûna dewleta Sûriyê çi pênaseyek jibo mirovên Kurd û şêniyên Rojavayê Kurdistanê naket.

Dewleta Sûriyê li ser nikolî (haşa kirin) li mirovên Kurd ava bûye û li ser ew rêbazê jiyanê diket. Qanûn dewleta Erebiya Sûriyê çi derfet nedayne mirovên Kurd û li ser rêbaza nikolî kirin li mafê mirovên Kurd berdewame.

Dewleta Turka jî Bakûrê welatê Kurdistanê dagîr kiriye. Cîhan-bîniya qanûna dewleta turka jî li ser bin-axeya nikolî kirin li mirovên Kurd û hebûna welatê Kurdistanê ava bûye.

Li wan sed salên derbaz bûyî da, em gewahê çend komkujiyên gelê Kurd bi destê dagîrkerên Turk bûne. Tevî ku li wan 30 salên derbaz bûyî da bi caran kesayetiyên Kurd li hilbijartinên dewleta dagîrker da pişikdar bûne, lê nekarîne mafê mirovên Kurd li ew rêjîm ê da misoger biken ku li ser nikolî li hebûna kurda ava bûye. Gelê Kurd li Bakûrê Kurdistanê, bi pişikdarî li hilbijartina da temenê dagîrkerên welatê me dirêj diken û desthilata dagîrkera erênî diken.

Dewlet Êraqê jî ku Başûrê Kurdistanê dagîr kiriye komareke federala parlimaniye!

Hêjayê gotinê ye li roja ava bûna dewleta Êraqê ta sala 2005 ê gelê Kurd bi pêşengiya binemala Barzanî û Talebanî bo serxwe bûna Kurdistanê şer kirbûn, lê tevî komkujî û eşkenceya gelê kurd li Başûrê Kurdistanê, li rêya hilbijartinê erêniya dewletekê kirîne ku li rêya dengdan û parliman berdewam mafên gelê Kurd bin pê diket.

Berewajî peyman û xebata xwe jibo rizgariî li dewleta Êraqê, binemala Barzanî û Talebanî qanûna welatê Êraqê li ser gelê Kurd da sepandin.

Tevî şerê nawxweyî li nawbera erebên Şie û Sunî, pişikdariya kurda li dewletê da yêkitiya welatê Êraqê parast.

Gelê Kurd pêwîstî bi qanûn û saziyekê heye ku bikare bersiva pêwîstiya rûhî, rewanî, hêvî û tê-ramanên mirovê Kurd bide û erêniya çanda gelê Kurd bike.

Her wek em dizanin piştî herifîna komara Kurdistanê, li wan 80 salên derbaz bûyî da, gelê Kurd li rêya hizb û saziyên civakî, honerî û çandî we xwastiye mafê mirovên Kurd li sîstema dewletên dagîrker da misoger biket, lê sîstemên dagîrkerên welatê Kurdistanê derfeta wê hindê nedaye û nikarin biden.

Em Kurd nabît avahiya welatê xwe li ser qanûn, rêkxistin, kerb, keyfxweşî, şer û rikeberiya neteveyên dîke ava biken. Eger em hebûna xwe li ser bin-axeya qanûna neteveyên dîke biçînin em dê êxsîrê hest û daxwazê mirovên dagîrker bimînin û em nikarin mirov bûn û serbestiyê tam biken.

**Bandora ragehandinê li ser kole xwedan kirina mirovên Kurd**

Ez li gundekê Urmiyê li dayîk bûme, lê pêş ku ez jiyana gund tam bikem, li ber şerê ku dagîrkerê welatê me li ser gelê Kurd sepandibû, dayk û babê min jî weke gelek Kurda penaberê bajêr bibûn. Wek dibêjin tu dê bikarî gundî li gund da bikeye der lê tu nikarî gund li dilê mirovê gundî da bînye der. Lewma bi boneya serxweşî û keyfxweşiya, bi kelecanek gelek mezin em diçone gund. Li ser rêka Hêşmava, ew gundê ku dayka min lê ji dayîk bibû, dewleta Îranê pirsgehek danabû. Hemû gavê çekdarek bi çekek dirêj li bin sîbera ber dîwarek sipî radewsta. Li ser ew dîwar bi xetê sorê mezin, pê zimanê farsî niwîsî bûn; ´Ma ba kofr mîcengîm ne ba Kord´ ez bêjim ez 9 salî bûm, min dizanî ku ew nivîsîna farsî bi Kurdê dibîte ´Em digel kufrê şer diken nek digel kurda´ lê min nedikarî mijara, mêrikê çekdar û zimanê farsî bi xetê sor li ser dîwarê kurdê gundî têbigehim.

Niha 30 sal li ser ew bûyerê derbaz bûye ez taze têgeheştime ku dewleta farsa li ser axa Kurda navê şer digel cil û berg, ziman û çanda Kurda danîbû kufir û li heman demê da jî digot em şerê Kurda naken. 30 sal piştî ew bûyerê niha min zaniye ew kurdê ku jibo parastina cil û berg, ziman û çanda Kurdî li ser axa Kurdistanê berxwe dide bi kafir hatiye pênase kirin û dagîrkerên fars kuştina kurdê wisa bixwe bi erkek dînî dizane!

Gava ez zarûk bûm min nedzanî peyva kufr dibîte çi, ew peyvê pêş çavê min rengek tarî hebû û ew taritî bê bin kûr bû, lê niha min zaniye peyva kufr yanî nebawerî.

Tiştê ku serê min sir kiriye ewe ku Yêkta perestî li welatê Kurda ra belawî dinyayê bûye lê dagîrker, me bi nebawer (kafr) dizanin û dagîrkirina xwe erênî diken ku kurda bikujin.

Pêwîste em Kurd bizanin ku dagîrkerên welatê me bi rêkxistin û nawendên lêkolînê dirêjî bi dagîr kirina welatê me diden. Dagîrkerên welatê me li hemû çepera da, şer li ser çandina mirovê Kurd ragehandiye û bi rêbazên cuda koletiya mirovên Kurd misoger kiriye.

Herçend ku temenê Television (Dîtinekê bêje) li jiyana mirovahiyê da gelek kurte, lê bi rêbazeke zanistî lêkolîn li ser bandora wê hatiye kirin.

Dewletên xwedan aboriya pêşkewtî li rêya bernameyên television ê we rêberî û rênivîniya civakê diken û tê-bînî û tê-ramanên nû li serê mirovên civakê da diçînin.

Endamên civakê yan zaniyariyên xwe li mal yan jî li dibistanê verdigrin. Bi her awayî ew zaniyarî berhema bername rêjî û perwerdeya dewletê ye.

Dewlet li rêya ragehandinê (pirtûk, rojname, radio û television û tora întêrnêtê) cîhan-bînî û daxwazên xwe li ser civakê da disepîne.

Bi awayek giştî dewlet li rêya nawendên lêkolînê bandora bernameyên xwe li ser endamên civakê taqî diket ku bikare kargêriya xwe bihêztir biket.

Em dizanin ku li jiyana mirovekê da dem giranbuhatrîn nirx heye. Dagîrkerên welatê me li rêya bernameyên television ê we, pêngav bi pêngav çanda gelê me diguhere û çanda xwe li ser mirovên Kurd da disepîne û rêbaz û hizrên nû jibo jiyanê didanête pêşiya wan.

30 sal berê dagîrkerên welatê me pê tank, top û çekdarên xwe li kolanên Kurdistanê tîna bîra me ku Kurdistan welateke dagîrkiriye û mirovê kurd koleye. Lê ew rêbaza şer digel mirovê Kurd nirxek girane abûrî û canî jibo dagîrkerên welatê me hebû.

Îro rojê dagîrkerên welatê me li rêya perwerdê û pirtûka we dîroka gelê me ser li nû nivîsîne û pêka xizmet bi armancên xwe, pênaseyek dîrokî jibo gelê Kurd kirîne.

Her wisa pê bernameyên taybet li ser tora internet û television ê, bo jiyana mirovê Kurd rêbazên rewanî dîhar diken ku xizmeta cîhan-bîniya dewletên dagîrker diket.

20 sal berê bandora deng û rengê dagîrkerê welatê me li ser mirovê Kurd di television ekê li kuncikê malê da asê mabû û bêy ku mirovê kurd aghdarê bandora bernameyên television ê li ser rabûn û rûniştina xwe be, bala xwe didayê.

Lê, niha deng û bandora dagîrkerên welatê kurda, li rêya bernameyên pêngav bi pêngav (algorithm) li ser mirovê kurd, di telefûna destê mirovên Kurd daye.

Mirovê Kurd jî li rêya torên civakî weke Google, Microsoft, Facebook, X û Amazon ê li ser întêrnetê hest, hêvî û daxwazên xwe tîne ziman. Pêwîste em bizanin ku torên civakî li ser întêrnetê bernameyên nivîsîne û pêngav bi pêngav zaniyariya li ser mirova

kom diken û bêy ku mirov agahdar be, pê ew zaniyariya, bernameya li ser mirova da disepînin. Xwedanê malperên weke Instgram û X ê biryarê diden ku çi mirovek li çi demekê da çi cûre zaniyariya bibînît û digel çi kesekê da pêwendî hebît.

Hêjayê gotinê ye hemû malperên ser întêrnêtê zaniyariya li ser ew kesa kom diken ku seredana malperên wan diken.

Mînaka herî berçav kampaniya Meta (xwedanê facebook, whatsapp û instgram) ê ye. Dibêjin ta sala 2016 kampaniya Meta yê 500 nixte zaniyariyê girîng li ser her kesê ku hisabek li Facebookê hebû kom kiribûn.  Niha dibêjin Metayê, vê gavê 5000 nixte xalên zaniyariyên girîng li ser her kesê ku li Metayê da hisab hebe kom kirîne. Zaniyariyên mîna temen, cihê jiyanê, kar, xwarin, rewşa aborî, baweriyên dînî, çava dem derbaz kirin, qalîteya saxlemiyê, xew, baweriyên siyasî!

Meta cihê pêyê mirova li ser întêrnêtê dişopîne û dikare bi bername rêjî texmîn bike ku li çend salên pêşber da mirov dê çava hizir bike!

Tiştê balkêş ewe, bêy ku tu agahdar bî, kampaniyên ragehandinê weke Meta yê, dikare pê bernameyên pêngav bi pêngav, bi deng û reng bandore li ser şêweya hizir kirin û biryara te danêt.

Pêwîste mirovên Kurd agahdar bin ku ew kampanî berdewam bazirganiyê bi zaniyariyên kurda diken. Bêguman dagîrkerên welatê

Kurda jî, ew zaniyariyên wan li ser tora întêrnetê, bo şerê rewanî li dijî kurda bikar tîne.

Caran eger dagîrker çekdarek bîhanî li kolanên Kurdistanê da bû, niha bêy ku em bizanin, dagîrker li rêya têlêfûna li destê me da bûye dengê di serê me da.

Eger 30 sal berê dagîrkera bi hêza top û tanka nedikarîn kolanên welatê Kurda dagîr biken niha bi hizrên çandî bûne deng û reng di serê kurda da û mêjiyê kurda dagîr kirîne. Mirovê Kurd agahdarê ew şerê rewanî nîne ku gelek hêdî û pêngav bi pêngav li ser wî tê meşandin û bandora wê li ser xwe û nifşa paşerojê jî nizane.

Bo mînak eger tu biçiye ser Youtube ê sitraneke Kurdî bigerêy, piştî 5 sitrana bernameya Youtube ê dê niviya sitranê bikete Kurdî nivya dîke dê bikete zimanê dagîrkera. Bêy ku tu agahdar bî piştî 10 sitrana tu hişyar dibî ku tu guhdariya sitranên dagîrkerê welatê xwe dikey.

Li rewan-nasiyê da, jibo ew rêbaza şer mînaka beqê tînin ku li naw ava sar da dikelînin. Dibêjin jiboy ku beqê li nav avê da bikelînin, li destpêkê da beqê dihavêjine naw ava sar da û hêdî hêdî avê germ diken. Çimkî hêdî hêdî avê germ diken beq hest pê naket, taku av gelek germ dibît û masûlkê beqê bê hest dibin û edî beq nikarît li naw avê da baz dete derê û beq bi saxî li nav avê da dikelît.

Ew şerê rewanî ku dagîrkerên welatê me, jibo helandin û li nav birina Kurda dest pê kiriye hêdiye, lê gelek bandorek mezin didanête ser mirovê Kurd.

Bihêztrîn aliyê bandora ew şerê rewanî ewe ku mirovê Kurd agahdarê ew şerê rewanî li ser xwe nebûye!

Pêwîste em mirovên Kurd hişyarê hebûna xwe bin û bi dil, li mirov bûna xwe xwedan derkevin û xwe li dare koletiyê rizgar biken û bi nav û bawerî bi XWE DÊ, Padişah bijîn û Kurdistanê jî bikene Padişahî.

# BI NAVÊ XWE DÊ PADIŞAH BIJÎ Û KURDISTANÊ JÎ BIKE PADIŞAHÎ